Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Hejmar :744 18-Adar- 2020 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Helebce... êşa ku nayê jibîrkirin!

Di ser komkujiya Helebceyê re 32 sal derbas bûn, lê êş û birînên komkujiyê heta niha di dil û wijdana gelê Kurd de zindî ne. Kesên ji komkujiyê filitîn, ji ber bandora kîmyayê êşê dikişînin.

14 û 15`ê Adara 1988`an, bajarê Helebce ku li derdora 240 km. li bakurê rojhilatê paytexta Iraq Baxdayê dikeve û 11 km dûrî sînorê Îranê ye, bi tangan hat topbarankirin ku bi rûxandina pencereyên malan re wek amadekariya senaryoyeke din xuya dikir.
16`ê Adarê… Ji asîman jehir dibarî
Saet 11:30`an, 50 balafirên şer ên Iraqê bi ser bajarê Helebce ketin ku 80 hezar kes lê dijiyan û heta 5 saetan moşek, bombe û gazên jehrê bi ser serê şêniyan de barandin.
Li gorî şahidên wan rojan, piştî bombebaranê, bajarê





Helebce ket xeweke giran ku ti deng nedihatin bihîstin û ti tevger nedihat dîtin. Herwiha şopên jiyanê winda bûbûn. Tenê di çend saetan de, zêdetirî 5 hezarî sivîl ku di nav de zarok, jin û kesên temenmezin hebûn, jiyana xwe ji dest dan û nêzî 10 hezar kesên din birîndar bûn.
Êrîşa bi kîmyayê ya hêzên Iraqê li dijî bajarê Helebce wek komkujiyên li welêt yên herî xerab hat hesibandin. Cenazeyên qurbanên komkujiyê li her dera bajêr belav bûbûn.
Piştî ku lêkolînên tenduristiyê li ser tiştên ji bajêr û ji cenazeyên qurbanan hatine birin, pêk hatin, pisporan diyar kir ku 3 cureyên gazên jehrî (siyanîd, gaza xerdel ya jehrî, gaza sarîn ku bandorê li eseban dike) di topbarana bajêr de hatine bikaranîn.
Piştî çend salan, Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî navên zêdetirî 17 hezar kesên ku sala 1988`an ji bajarê Helebce di bombebarana kîmyayî û di pêngavên Enfalê de winda bûyîn, kom kirin. Li gorî rêxistinê li ser malpera xwe ya fermî belav kirî, hê jî bi sedan kes winda ne.

**DUBAREBÛNA KOMKUJIYAN**

Di dîrokê de û heta niha gelê Kurd rastî gelek komkujî û qirkirinên komî yên bi destê sîstemên zordest tê ku Kurdistanê dagîr dikin. Ji komkujiya Dêrsimê ya sala 1938`an, komkujiya Helebc, komkujiyên çeteyên DAIŞ`ê li Şingalê sala 2014`an û li Kobanê sala 2015`an bigire û komkujiyên dawî yên dewleta Tirk li Efrînê sala 2018`an de, Serêkaniyê û Girê Spî.

## Li sûkên gerok her pêdiviya welatiyan peyda dibe

Ji ber erzaniya bihayê pêwîstiyan û ji ber ku her tişt lê peyda dibin, sûkên gerok rastî eleqeyeke mezin ya şêniyên navçeya Girkê Legê û Çilaxa tên.
Bi daketina nirxê lîrayê Sûrî li hemberî dolar, bihayê pêwîstiyan bilind bû. Ji ber wê elaqeya şêniyan a ji sûkên gerok re ku her roj li cihekî tê danîn û bi navê wê rojê tê naskirin, zêde dibe. Li van sûkan bihayê pêdiviyan ji deverên din erzantir e.
Li navçeya Çilaxa ya girêdayî kantona Qamişlo sûka Sêşemê heye.
Kamîreya ANHA'yê di nava sûkê de geriya û nêrînên hin şênî û firoşkaran girtin.
Sûk li qadek berfireh di nava taxan de ye û nêzî sûka bajêr e. Şaredariya Gel ev cih ji bo vê sûkê diyar kiriye.
Sûk serê sibehan heta berêvarê vekirî ye. Ji şînkayî heta, cil, caw û hwd welatî pêdiviyên xwe ji vê sûkê dikirin.
Welatî dibêjin her tişt li vê sûkê heye û bihayê pêwîstiyan kêm e.



## Rêveberiya xweser li penaberan xwedî derket

**Darîn SILÊ/Ronahî Qamişlo**

9`ê cotmeha 2019an ji ber êrîş û dagîrkeriya Dewleta Tirk, li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, bi hezaran xelkên herêmê ji bajar û malên xwe dûr ketin. Ji bo xwedîderketina li wan Rêveberiya Xweser bi navê Waşokanî kampek ava kir.
Ji welatiyên li Kampa Waşokanî, Umer Ehmed Xedban, li ser destpêka şerê li Serê Kaniyê û dema derketina wan ji bajêr, ji rojnameya me re wiha axivî: "Ez ji Serê Kaniyê ji Taxa Ronahî me. Du kurên min hene. Berî şer ji me re digotin emê êrîşî bajarê we bikin, lê me bawer nedikir ku dewleta Tirk bi qirêjiya xwe erîşî me bike. Bi destpêkirina şer re me gelek astengî dîtin, bi taybetî dema derketinê de. Çimkî erebeyên me tinebûn. Destpêkê me berê xwe da Çiyayê Ebdulezîz. Em li wir qederê du heyvan li gel mirovên xwe man. Bişt re em hatin Kampa Waşokanî. Rêveberiya kampê alîkariya me kir. Li vê derê em jiyana xwe diqedînin."
Umer Ehmed Xedban axaftina xwe wiha domand: "Serê her heyvê rêveberiya kampê xwerek û pêdiviyên jiyanê (weke nîsk, şekir, birinc, savar, rûn û galonê zeytê) li me belav dike. Weke din kehrebe, av û mazota me jî heye."
Emer Ehmed axaftina xwe wiha qedand: "Hêviya min ew e ku em vegerin bajarê xwe û li hemberî dagîrkeran bisekinin."

**RÊXISTINA PARASTINA ZAROKAN (SAVE THE CHILDREN) ALÎKARIYA PENABERÊN LI KAMPA WAŞOKANÎ DIKE**

Li ser heman mijarê Endamê Rêxistina Rarastina Zarokan (Save The Children) Basil Dendel, li ser alîkarî û xebata li Kampa Waşokanî, ev agahî dan rojnameya me: "Ji meha Çile ve me dest bi xebata xwe ya li kampê kiriye. Her heyv em alîkariya xelkên li kampê dikin. Destpêkê hin zehmetî hebûn, lê niha bi rêxistinî û nav bi nav em alîkariyê didin. Em xwerek û pêdiviyên baqijiyê jî didin wan. Li gorî jimara malbatê em alîkariyê didin. Hin malbat jî rewşa wan ne baş e, bi derfetên heyî em alîkariya wan dikin."
Basil Dendel bal kişand ser rewşa zarokan û got, "Ji ber şer û koçberiyê zarok dilşikestî bûne û tirs ketiye nava wan. Ji bo wê, demên pêş emê alavên lîstokan bînin û cihê lîstinê ji wan re çêkin."
Endamê rêxistina parastina zarokan (save the children) Basil Dendel axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Bi vê gavê em kêfxweş in. Di demeke wiha de divê em ji gelê xwe re alîkar bin û morale wan xurt bikin. Bi hêvî me rêxistinên din jî yên alîkariyê, ji kampê re bibin alîkar. Çimkî gelê me di rewşeke asteng de ye û pêdiviya wî bi her tiştî heye."









## Em bi yekîtiyê dikarin rê li ber jenosîdan bigirin



Xebata Tifaqa Kurdistanî bi pêmana 32. ya komkujiya Helebceyê, diyar kir ku jenosîda Helebceyê bi şermezar dikin û wiha hat gotin: "Erkû her partî û Kurdistaniyan ew e ku rastiya neteweya Kurd bibinin û ji bo yekîtiyê bixebitin. Bi vî rengî dikarin pêşiya jenosîdên nû yên mîna Helebce bigirin."*R-4*

## Sûriye xelateke jeosiyasî ye û divê were bidestxistin'



Pisporê Emerîkî Dr. Thoreau Redcrow got "Sûriye mîna textê kişika cîhanî ye. Aliyên destwerdanê dikin, ne wek pirsgirêkekê, wek xelateke jeosiyasî lê dinêrin û dixwazin bi dest bixin. Fikrê Ocalan nexşeriyeke demokratîk a alternatîf e. Kurd wê bibin hêza yekê ku hewl didin Rojhilata Navî ava bikin." *R-4*

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Hejmar : 744 18-Adar- 2020 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Artêşa Tirk rastûrast sivîlan dike hedef



Koçberên gundên Girê Spî û Eyn Îsayê yên ji ber êrîşên arteşa Tirk a dagîrker û çeteyên wê ji warên xwe derketîn gotin, "Sedema koçberbûna me dagîrkerî ye. Ji bo wê dewleta Tirk gundên ku sivîl tê de ne dikin hedef." *R-6*

# 'Peyama Rêbertiyê hêzê dide'

Berpirsê têkiliyên dîplomasiyê yê PYD'ê Bekir Hec Îsa diyar kir ku peyama rêber Abdullah Ocalan di pêvajoyeke hesas de hat û got " Peyama Rêbertiyê hêzê dide projeya li herêmê". Bekir Hec Îsa banga parastina destkeftiyên gelê Kurd û gelên herêmê kir. *R-4*





## Bi xebateke komînal karê xemilandina şarpeyan dikin

» Hînî hunera xemilandina şarpeyan bû û di nava jinan de belav dike. Niha vê hunerê fêrî jinên ciwan jî dike. Şêniya ji Efrînê Silava Mistefa bi riya vê pîşeyê gelek jin di xebateke komînal de kom kirin. *R-3*



## Her maskeyek çîroka jinekê ye

» Beyan Behramî (41) jineke ji bajarê Sîne yê Rojhilat e. Behramî hunermendek e ku ji kartonên hêkan, bi zelîqokê û ardê garisan maskeyan çêdike. Bi pêmana 8'ê Adarê û ji bo Newrozê, pêşengehek bi navê "Maskeyên Diaxivin" ya ku hestên jinan temsîl dike li Galeriyayê vekir. Behramî, got: "Di her maskeyê de çîroka jinekê heye." *R-3*




## Ciwanên Kurd ji bo yekîtiya kurdî komxebatek li dar xistin

» Bi durişma "Yekîtiya ciwanên Kurd bingehê yekîtiya neteweyî ya kurdî ye" Meclisa Ciwanên Kurd komxebatek li bajarê Qamişlo li dar xist. *R-6*

## Ji şerê wekîlan veguherî şerê esîlan



Xetera herî mezin a li ser gelê Sûriyê destwerdana Tirkiyê ye. Şoreşa Sûriyê pir dirêj nekir û veguherî aloziyeke bi girêk ku ev 9 sal in dewam dike. Di dirêjayiya van salan de hêzên herêmî û navdewletî destwerdana Sûriyê kirin û veguherandin qada şerên dijwar. Gelo di van salan de gelê Sûriyê çi kişand? *R-5*

## El-Mismarî: Erdogan xelîfeyê çalak ê terorîstan e

Ehmed El-Mismarî got "Erdogan xelîfeyê çalak ê terorîstan e û gelek Tirk û çeteyên Sûrî li Lîbyayê hatine kuştin." *R-5*



# Gerînendetiya Tenduristiyê ya Hesekê bang li gel kir ku li gorî hişyariyan tev bigerin

Hevserokê Gerînendetiya Tenduristiyê ya kantona Hesekê Ebdulezîz Meo got Desteya Tenduristiyê 7 odeyên cudakirî li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê belav kirin, wek girtekekê li hemberî belavbûna nexweşiya vîrûsa Koronayê amade kirine û bang li gel kir ku tevayiya girtekên hişyariyê yên ku aliyên têkildar girtine, bînin cih.

Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê wek girtek li dijî vîrûsa Korona ya nû (Covid-19), dibistan û saziyên sivîl girtin. Gelek girtekên hişyariyê li deriyên sînor girtin. Kombûn û tevayiya çalakiyan li herêman qedexe kirin. Bi tevlêbûna şaredariyan û komîteyên pispor desteyek ava kir. Herwiha bernameyeke pakkirina cihên giştî, saziyan û dibistanan li herêmê hat danîn.

Ji bo naskirina vîrûsa Korona rêbazên parastinê hevserokê Gerînendetiya Tenduristiyê ya Kantona Hesekê Ebdulezîz Mao ji ANHA'yê re axivî. Mao got, "Vîrûsa Korona bi mirov û lawiran dikeve. Ev vîrûs li bajarê Wohan ê Çînê hat vedîtin. Piştre li piraniya welatên cîhanê belav bû."

Mao bal kişand ser nîşanên pêketina vîrûsa Korona ku dişibin yên înfiluenzayê. Mirovên pê dikevin, ziwa dikoxin, laşê wan germ dibe û nefesa wan teng dibe. Ev vîrûs bi riya bêhnijîn û koxikê yan jî bi riya hewayê yan jî girtina destan belav dibe. Ev vîrûs êrişî pergala nefesê ya mirov dike.

**RÊBAZÊN PARASTINÊ**

Mao rêbazên parastinê destnîşan kirin û wiha got: "Divê mirov her 2 saetan carekê destê xwe bişû û berî û piştî destavê jî. Divê di cihên qerebalix de kemame (maske) û lepikan bi kar bînin. Ji cihên wisa dûr bikevin. Hewaya malan her tim biguherînn. Di dema belavbûna nexweşiyê de neçin derveyî herêmê. Tevî bicihanîna tevayiya girtek û perspektîfên aliyên têkildar."

Ebdulezîz Mao diyar kir ku Desteya Tenduristiyê ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê 7 odeyên cudakirî ji ber hewandina haletên nexweşiyê, ger çêbin, amade kirine. Wê kesên nexweş heta 14 rojan di wan odeyan de werin cudakirin (karantîna). Derbasî taqîgehên pêwîst bibin da ku teqez bibe vîrûs di laşê wan de heye yan na.



Mao bang li gel kir ku tevayiya girtekên hişyariyê yên ku aliyên têkildar girtine, bînin cih û li paqijiya xwe ya taybet baldar bin û ji cihên qerebalix dûr bikevin.

## Rêveberiya Xweser ji bo 4 rojan betlane ragihand

Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, ji bo 4 rojan betlaneya fermî ragihand.

Ji aliye Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ve ku di çarçoveya tedbîrên vîrûsa Korona de civîn, xwepêşandan û meş hatin betalkirin, ji bilî saziyên mecbûrî bixebitin, li saziyên rêveberiyê hemûyan betlane hat ragihandin.




**'JI BO PÊŞÎ LI BELAVBÛNÊ BÊ GIRTIN'**

Di biryarnameya Rêveberiya Xweser de ya bi jimara 28'an wiha hat gotin: "Ji bo pêşî li belavbûna vîrûsa Korona bê girtin ku bûye nexweşiyeke cîhanî, ji bo Komîteya Tenduristiyê li saziyan, daîreyan û avayiyên giştî karê dezenfektasyonê bike, biryara betlaneyê hatiye girtin.
Di vê çarçoveyê de ji bilî saziyên ku mecbûr in bixebitin, saziyên fermî yên ser Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ji 16'ê Adara 2020'an heta 19'ê Adara 2020'an ketine betlaneyê."

## Kolana pîşeyî ya Taxa Şêxmeqsûd bûye meqeseda şêniyên Helebê

Kolana Sinaa ya Taxa Şêxmeqsûd a Helebê di dema êrîşên ser taxê de wêran bûbû. Lê piştî YPG û YPJ'ê herêm ji dagîrkeran rizgar kir, ewleyî vegeriya herêmê û şêniyan dest bi kare xwe kir. Niha herêm bûye meqseda şêniyên Helebê.

Dema aloziya Sûriyê gihîşt Helebê, herêma Sînaa (pîşeyî) ya Taxa Şêxmeqsûd hat topbarankirin û bû herêmeke şer. Rêveberiya dewleta Sûriyê û çeteyên artêşa Tirk a dagîrker êrîşî taxê dikirin. Sala 2016`an YPG û YPJ`ê Taxa Seken Şebabî, Benî Zêd û Eşrefiye ji çeteyên Tirkiyê rizgar kirin. Piştî vegera ewleyiyê şênî vegeriyan warên xwe û ji nû ve dest bi karê xwe kirin.
Li kolana 15an ser 300î re dikan û werşeyên pîşeyî mîna mekanîk, hesinkar, kehrebeya erebeyan, dûzan û hwd. Hatin vekrin. Li rex wê jî bi dehan dikanên taybet ên firotina amûr û alavên pîşeyî û parçeyên guhertinê yên erebeyan hatin vekirin.



Zêdebûna nirxê dolar li beramberî lîreyê Sûriyê bi awayekî neyînî bandor li pîşesazên Helebê bi taybetî yên Taxa Şêxmeqsûd kir.
Tevî wê jî kolana pîşeyî ya li Taxa Şêxmeqsûd bûye meqseda şêniyên bajêr. Lewre bihayê li wir li gorî herêmên pîşeyî yên din guncawtir e.
Xwediyê werşeya sererastkirina heykela erebeyan Cîhad Merwan got, ji ber bilindbûna dolar em gelek zehmetiyan dikişînin. Ji ber wê em jî neçar in destheqê xwe bilind bikin.
Şaredariya Gel a Taxa Şêxmeqsûd hewl dide xebata bingehîn ji pîşesazan re peyda bike, da wan teşwîqî berdewamkirina pîşeyên xwe bikin.

## Komkujıya Helebce heta niha berdewam e



**Dilîn EHMED/Ronahî Qamişlo**

Bi pêmana 32. ya salvegera komkujiya Helebceyê, meclisên bajarê Qamişlo û gel pênc deqîqeyan bêdeng rawestiyan.
Di 16`ê Adara 1988`an de komkujiya Helebce çêbû. Bi vê pêmanê gel û meclisên bajarê Qamişlo li qada teqîna Taxa Xerbî, pênc deqîqeyan bêdeng li ser giyanê şehîdên Helebcyê sekinîn û şehîdên azadiyê bîr anîn. Herwiha li ser komkujiyên li ser gelê Kurd çêbûyîn, bi taybetî komkujiya Helebceyê, ji aliyê meclisan ve, daxuyaniyek hat xwendin.
Di bîranînê de rêvebera Kongra Star a Qamişlo Menîca Heyder, li ser komkujiyê ji rojnameya me re axivî. Menîca wiha got: "Bi destê faşîst Sedam Huseyn bi çekên kîmyayî, ser 5500î re Kurd şehîd bûn. Em şehîdên vê komkujiyê û şehîdên azadiyê her sal bi rêzdarî bîr tînin. Çawa ku



tê zanîn êrîşên niha li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê, ji aliyê dewleta Tirk ve tê kirin, berdewama vê komkujiyê ne."
Menîca Heyder di dawiya axaftina xwe de bang li gelê Kurd kir ku, li xwîna şehîdan û destkeftiyan xwedî derkevin. Menîca axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Ji bo ku em derfetê nedin dewletên desthiladar armanca xwe pêk bînin, divê em têkoşînê pêş bixin. Bi taybetî em bang li jinan dikin ku, dijmin her tim di êrîşên xwe de vîna jinan dike hedef. Ji ber wê pêwîst e em li ber xwe bidin. Encax bi berxwedanê em pîlanên dagîrkeran têk bibin."



# Koçberî li pêşiya pêşxistina hunera wê nebû kelem

Sena Ebas ku ji ber êrîşan ji warê xwe koçber bûye, li hemberî şert û mercên zehmet bi vîn û israra xwe komeke mûzîkê ava kir. Koçberî li pêşiya geşkirina hunera wê ya jenîna piyanoyê nebû kelem.

Dewleta Tirk a dagîrker û çeteyên wê di êrîşên xwe yên ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de di serî de qirkirina çanda gelên herêmê kirin hedef.
Di encama êrîşên artêşa dagîrker û çeteyên wê de ku heta niha jî dewam dikin, zêdeyî 300 hezar sivîlî ji herêmên li ser sînor ên Tirkiyê dagîr kirin, koçberî deverên din yên Rêveberiya Xweser bûn.
Her koçber li gorî hêza xwe û bi şêwazê xwe berxwedanê didomîne. Ji wan jina bi navê Sana Ebas ya ji bajarê Serêkaniyê ye. Sanali piyano dide.
Sena ku koçberî Reqayê bûye, koçberî li pêşiya pêşxistina hunera xwe astneg nedît û bû hevseroka Navenda Çand û Hunerê ya bajarê Reqayê.
Sena Ebas ya ji gundê Um Îzam yê Serêkaniyê, peymangeha mûzîkê xwendiye. Sena bi dayîna dersên mûzîkê ji bo zarokan li navenda çandê ya Serêkaniyê dest pê dike piştre dibe endameke Yekitiya Hunermendan.
Sena diyar kir ku tevî koçberiyê teslîm nebû, hunera xwe domand û zarokan perwerde dike.
Sena bi hevkariya navenda Çand û Hunerê ya Reqayê koma zarokan a stranan ava kiriye.
Li ser bajarê xwe Serêkaniyê Sena Ebas wiha dibêje:



"Bajarê min mîna baxeke gulên rengûreng bû. Dagîrekriya Tirk û çeteyên wê wêran kirin û şêniyên wê koçber kirin.

## "Ji bo Azadiyê" li Berlînê hat nîşandan




Fîlmê "Ji bo Azadiyê" li Berlînê cara pêşî hat nîşandan. Piştî nîşandana fîlm Derhêner Ersîn Çelîk got, divê hunermend û rewşenbîr bi qasî şervanan wêrek bin.''
Fîlmê "Ji bo Azadiyê" ku berxwedana dîrokî ya Sûrê vedibêje, li paytexta Elmanya Berlînê cara pêşî hat nîşandan.
Fîlm li sînameya Babylonê hat nişandan. Hunermendên sînameya Kurd, rewşenbîr û siyasetmedarên Kurd jî di nav de gelek kesî li fîlm temaşe kir.
Piştî rêzgirtina ji bo fermandarê berxwedana Sûrê Çiyager û şehîdên din, fîlm hat nîşandan.

**'HUNERMEND Û REŞWENBÎR DIVÊ WÊREK BIN'**

Piştî nîşandana fîlm Derhêner Ersîn Çelîk axivî: Çelîk bal kişand ser êrîşên qirker û dagîrker ên li ser çar parçeyên Kurdistanê û got, ''Di rewşeke wiha de ku rastiya Kurdistanê ev e, divê hunermend û rewşenbîrên Kurd jî mîna şervanan wêrek bin. Di rewşekê de ku şerê Efrînê û Reqayê dom dikir, me jî xwest wêrekiya şervanên Sûrê nîşan bidin. Ev welat welatê me ye û huner li gel her tiştî divê bidome.''

## Qedexekirin bandorê li rêûresma cilûbergên Kurdî dike

Berê lixwekirina cilûbergên kurdî di nava kesên bitemen de çandek bû, niha ev nêrîn bi awayekî paş de ketiye. Her sal rojek ji bo cilûbergan hatiye diyarkirin û jê re Roja Cilûbergên Kurdî tê gotin, lê belê li başûrê Kurdistanê ji ber biryara yektîp cil, qedexe ye xwendekar bi cilûbergên Kurdî biçin xwendingehan.
Li başûrê Kurdistanê 10'ê Adarê Roja Cilûbergên Kurdî ye. Sala borî xwendekarên xwendingeh û zanîngehan, her wiha karmendên sazî û dezgehan bi pêmana vê rojê cilûbergên Kurdî li xwe dikirin. Lê belê bi egera tedbîrên li hemberî vîrûsa Koronayê li xwendingeh û saziyan dewam nîne, îsal ev rêûresm li wan deran pêk nayê.
Salên borî di civakê de welatiyên di her temenî de girîngî didan cilûbergên Kurdî. Lê belê di




roja me de têkildarî vê mijarê bi awayekî berbiçav paşdeketin çêbûye. Niha ciwan tenê di mûnasebetan de cilûbergên Kurdî li ber xwe dikin.
Li başûrê Kurdistanê ji ber ku pergala cilên yektîp, qedexe ye xwendekar bi cilûbergên Kurdî biçin xwendingehan.

## Polîsên Tirk wêneyên kesên diçin komeleya zimanê kurdî digirin

Polîsên Tirk, gava rêveber û xwendekarên Komeleya Ziman û Çandê ya Birca Belek a Cizîrê diçin komeleyê li ber deriyê saziyê wêneyên wan digirin.
Polîs xwendekar û rêveberên Komeleya Ziman û Çandê ya Birca Belek a Cizîra Şirnexê neriher dikin. Ji roja komele hatî avakirin heta niha polîs tim diçin ber derî û carna jî wêneyên xwendekarên wê digirin.

**DI DEMA KURSÊ DE TÊN**

Rêveberê komeleyê Mesût Uçkaç, diyar kir ku ji rofa kursên wan ên ziman dest pê kirîn heta niha polîs tên ber avayiya komeleyê û wêneyêdîmenên xwendekar, rêveber û xebatkarên komeleyê digirin. Uçkaç got, jdi dema perwerdeyê de komek polîs tên ber derê komeleya me. Ev zoreke derûnî ye. Gava em ji




wan dipirsin, dibêjin em li gorî fermanê tev digerin."
Uçkaç, da xuyakirin ku perwerde mafê sereke yê mirovan e û bal kişand ser zora li ser zimanê kurdî. Uçkaç got armanca me, em li zimanê xwe xwedî derkevin. Bi van zext û zoran dixwazin pêşî li ber zimanê kurdî bigirin. Bi vî awayî dixwazin komeleyê bigirin."

Endamê Komeleya Nivîskarên Mezopotamyayê Bahattîn Yagarcik jî da xuyakirin ku sazî û dezgehên kurdî ji ber polîtîkayên înkar û asîmlasiyonê tên girtin û got, zimanê me, dewlemendiya welatê me û cîhana me ye.

## Li Êlihê Mala Dengbêjan ji nû ve hat vekirin

Li Êlihê Mala Dengbêjan a ji aliyê qeyûmê dagîrker ve hatî girtin, piştî 3 sal û nîvan dîsa hat vekirin. Dengbêj Ehmedê Xiyî da zanîn ku çanda dîroka sedê salan diparêzin û got emê dengbêjên ciwan bigihînin.
11'ê îlona 2016'an dewleta Tirk ya dagîker Şaredariya Êlihê dagîr kiribû û gelek saziyên çand û hunerê yên şaredariyê girtibûn.
Yek ji van saziyên hatîn girtin Mala Dengbêjan bû. Mala Dengbêjan 3 sal û nîvan girtî ma. Şaredariya Êlihê ya HDP'ê dîsa ji nû ve Mala Çandê ya Dengbêjan vekir
Ji dengbêjan Ehmedê Xiyî bal kişand ser girîngiya birêxistinkirin û pêşxistina çandê û got, "Vekirina Mala dengbêjan wê pêşî li jibîrkirina dengbêjiyê bigire. Wê bi mala me re çanda dengbêjiyê zindî bimîne. Emê li vir dengbêjiyê bidin danasîn û ji bo gihandina dengbêjan emê bixebitin.



# Ciwanên Kurd ji bo yekîtiya kurdî komxebatek li dar xistin

Bi durişma “Yekîtiya ciwanên Kurd bingehê yekîtiya neteweyî ya kurdî ye” Meclisa Ciwanên Kurd komxebatek li bajarê Qamişlo li dar xist.




Komxebat li hola zanîngeha Rojava ya bajarê Qamişlo bi beşdariya 150 nûnerên ji rêxistinên siyasî yên ciwanan, endamên Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê – Rojava (KNK) li dar ket. ENKS jî ji bo panelê hatinbûn vexwendin, lê beşdar nebûn.
Di komxebatê de endama Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê ya Rojava Ebîr Hesaf axivî. Ebîr Hesaf gavên ciwanên Kurd ji bo yekîtiya kurdî avêtîn, silav kir û hêvî kir ku denge Kurdan li Rojava bibe yek.
Pişt re dengê rewşenbîrên Kurd Dr. Nûrî Dêrsimî ku tê de behsa rola ciwanan dike hat guhdarkirin.
Di komxebatê de li ser van 3 xalan nîqaş hat kirin; girîngiya yekîtiya kurdî, astengiyên wê û çareserî.
Derbarê astengiyên li pêşiya yekîtiya kurdî, ciwanan diyar kir ku hin kesayet û partiyên Kurdî berjewendiyên kesayetî li ser berjewendiyên giştî yên gelê Kurd re digirin. Herwiha hat gotin divê ciwanên Kurd bibin yek û li hemberî van kesayet û partiyan bisekinin, li hemberî planên derve re hişyar bin û ji bo avakirina yekîtiya kurdî bixebitin.

## Zanîngeha Rojava bûye hêviya xwendekaran

**Hediya HISÊN**

Ji bo bilindkirina asta xwendinê, Rêveberiya Xweser hewl dide derfetên xwendinê ji bo her kesî biafirîne û Sûriyeke demokratîk ava bike. Bi vê armancê ku Zanîngeha Rojava ava bûye, pêş dikeve û beşeke nû ya Mîkatronîka vedike.
Serokê peymangeha mîkatronîka Doktor Endezyar Kesra Hersan, li ser vê mijarê ji rojnemeya me re wiha axivî: “Peymangeha mîkatronîka sala 2019an hat damezirandin û yekê meha 12an me dest bi xwendinê kir. Niha 14 xwendekar û 8 mamosteyên me hene. Em li bendê ne di demeke nêzîk de çend mamosteyên din jî tevlî me bibin. Piraniya materyalên me zanistî ne û endezyariya mîkatronîka ji beşa elektrîk, elektron û mekanîkê pêk tê. Heta niha dema vê beşê sê sal in, lê em dixwazin bikin pênc sal.”
Kesra Hersan axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Xwendekarên me zû pêş dikevin û eger rewş baş bibe, em bi hêvî ne di dema pêş de ji bo xwendekaran kargeh jî ava bibin.”
Derbarê mijarê de, xwendekar Lewend Hecî Yûsif jî wiha axivî: “Piştî dewleta Tirk Efrîn dagîr kir em koçberî Şehbayê bûn. Piştî ku min li wir xwendina xwe qedand, min berê xwe da Zanîngeha Rojava. Niha li beşa mîkatronîka ku gelek endezyariyan digire nava xwe, dixwînim.”
Lewend axaftina xwe wiha domand: “Zanîngehê ji me re xewgeh jî ava kirye û ji bo pêşketinê mamosteyên me pir kedê didin. Sîstema xwendinê jî gelek pêşketî ye û ji xwendekarên Başûr û Rojhelatê Sûryê re gelek derfetên pêşketinê vedike.”
Lewend axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Destpêkê pirsgirêk pir bûn. Lê me ked da û em bi ser ketin. Xwendekar hemû jî bi vê rewşê kêfxweş in. Serkeftinê ji hevalên xwe tevan re dixwazim û spasiya mamosteyan û zanîngehê jî dikim.






## Koçber: Artêşa Tirk rastûrast sivîlan dike hedef

Koçberên gundên Girê Spî û Eyn Îsayê yên ji ber êrîşên arteşa Tirk a dagîrker û çeteyên wê ji warên xwe derketîn gotin, “Sedema koçberbûna me dagîrkerî ye. Ji bo wê dewleta Tirk gundên ku sivîl tê de ne dikin hedef.”
Artêşa Tirk a dagîrker û çeteyên wê her roj herêmên Girê Spî û Eyn Îsayê topbaran dikin.
Bi taybetî gundê Fatse û Hiriyê yên Eyn Îsayê her roj tên topbarankirin. Ji ber wê şêniyên wan gundan ber bi kamp û gundên din ve koçber dibin.
Nûçegihanên ajansa nûçeyan Hawar rewşa koçberên niha li Kampa koçberên Girê Spî dimînin, şopandin û nêrînên wan girtin.
Jina bi navê Sara Hesen ji şêniyên gundên Fatse yê girêdayî navçeya Eyn Îsa wiha dibêje: “Artêşa Tirk a dagîrker bi topên xwe yekser gundê me dike hedef. Di gund de sivîl hene. Mala cîranê me hat topbarankirin, ji ber wê wêran bû û hinek ji wan birîndar bûn.”



Sara di dawiyê de wiha got: “Em neçar man ji gundê xwe derkevin û ber bi kampa koçberên Girê Spî ve koçber bibin. Em hêvî dikin vegerin malên xwe.”
Jina bi navê Zelxe Mistefa ya ji gundê Şergirakê jî wiha got: “Artêşa Tirk û çeteyên wê sedema koçberbûna me ne. Li wir ti ewleyî nîne heta ku em li malên xwe bimînin. Ji ber êrîşa dagîrkeran me terka gundên xwe kir û berê xwe da herêmên ewle.”

## koronavîrus û faşîzm



**Medeni FERHO**

Metirsîna “koronavîrûs”, ya li ser cîhanê, dewam dike.
Di demeke ku, sîstema kapîtalîst, bi planên paranoyak, faşîzma sedsalê bi hêz dikê de “koronavîrûs” derkete holê. Di dîroka cîhanê de, nexweşiyên bûne sedema “kotik”ê, gelek hene. Piraniya van kotikan, di dema ku artêşên mezin êrîşî herêm û welatan kirine derketine. Sîstema kapîtalîst, kultura tirsê ye.
Dibêjin, koronavîrûs, nêzî 80 salî heye, tedbîr ne hatine standin, lewma xwe guhert û wek heza i kujerî derkete holê.
Balkêş e, faşîzma dewşîrmeyên Îttîhadî sed sal in heye, bi her cûre rengê kotikê, komên xelkê tune dike. Di 32mîn salvegera komkujiya Helebce de, beriya wê û piştî wê, gelek komkujiyên bi destê faşîstan çêbûne. Hîtler, Saddam, Esad jî di nav de, gelek faşîst zarokên faşîzma devşirme ne.
Faşîma dewşirme, wek vîrûsa korona xwe guhert û bi çeteyên DAIŞê, El Nusra û hwd. dest komkujiyan kir, kerasatên şerma mirovahiyê kirin.
Di şerê cîhanê yê 3mîn de, 3 enî şer dikin: Eniya sermayeya li dijî netewe-dewletan, eniya sermayeya ligel netewe-dewletan, sêyemîn jî, eniya “riya sêyemîn” ku bi paradîgmeya Ocalan haraket dikê ye. Eniya yek û du, teknolojiya herî pêşketî bikar tînin, riya wan cûda ye, lê armanca wan yek e. Faşîzma Îttîhadiyan, bi pêşengiya Reîs Erdogan de, eniyên 1 û 2 baş bikar tîne.
Eniyek 1 û 2, hiquqê sîstema kapîtalîst diparêzin. Eniya 2mîn, guhertina di aliyê hişmendiya bi nasnameyên dijîtal dixwaze, çîne “elît” diparêze.
Lewma, her du enî jî, li dijî paradîgmeya Ocalan şer dikin.
Sûper hêzên cîhanê, ketine zaboqên teng: Li aliyekî faşîzma ku bi komên çete û hêzên paramilîter, (nevî lejyoner) , ku paşverûtiya nijadî ya lincê pêşdixe, bi şantajê kar dike heye, ji aliyê din jî hêzên global hene.
Li dijî her du aliyan jî, berxwedana gelan heye.
Şerê germ, li Suriye û Kurdistanê ye, lê hêzên global, li çar aliyên cîhan di nava şer de ne. Faşîzma Reîs Erdogan jî, ji bo tunekirina Kurdan û bi xeyalên cûde, li Kurdistanê, Rojhilata Navîn ,Ewropa û Efrîqa wek metirsinek cîhanî pîkolê dike. Cîhanê, li Idlibê dît ku korona mezin faşîzma Reîs Erdogan e, darbeyek lêd an. Reîs Erodgan, bi manewreyek ji kar ketî û xeşîm, hawara xwe gihande Ewropa û NATO, tiştek bidestnexist.
Ne faşîzma dewşirme, mixabin “koronavîrûs” mohra xwe li rojeva cîhanê da. Vê jî, sucên ku Erdogan dike, di odeyek tarî de hatin kilît kirin. Bi vî rengî hate xwestin ku pêşiya “Bihara Gelan” bigirin, lê berxwedana gelan dewam dike.
Hin derdor, “berxwedana gelan”, weke vegera Marx bi nav dikin. Ev jî, kêmdîtinek e. Veger nîne, paradigmeya Ocaalan heye. Ne çînê karker, gel berxwedanê dikin. Bêguman îdeolojiya Marx, zindî ye, li ser piyan e, lê piştî real sosyalzim û rewşa Çînê, hêvîyên ji çînê karker winda bûne. Edî gelên demokratîk di cengê de ne. Ev jî paradigmeya Ocalan e û “berxwedana demokrasiya demokrasî” ye. Di demokrasiyê demokrasî de, hemû çîn, bi taybetî jin hene. Jin, jiyan e!.. Ti sîstemên sosyalîst û şoreşan, kirasê jinê, li gorî jinê qaz nekirin û li jinê nekirin. Tenê Ocalan dazanîn ku jin, ne tenê amur e, ew, formulasyon û bingeha çareseriya sosyo-ekonomîk e. Ti îdeolog û lîderan, potansiyala gerdunî û hêza sosyo-ekonomîk ya jinê, di kedkarî û fedekariyê de, ku dikare kedê bi awayekî rasyonal biparêze û parve bike nedîtiye. Dîtibin jî, pêşnexistiye û nekirin pratîkê. Edî demokrasî û wekhevî, di gotina “jin jiyan e” de mohr bûye.
Faşîzm jî kotik e û ji bo krîzên sîstema kapîtalîst nabe çareserî. Divê cîhan, vîrûsa mezin bibîne. Sîstema kapîtalîst di nava “aczeke” mezin de ye; ne felsefeya Almanya, ne sosyo-ekonomiya Ingilîzan, ne sosyalîzma Fransa, wê nikaribe bersiva demê bide. Her sê disîplînên zanistî jî, di berjwendiyên neteweyî de hatine zincîr kirin.
Lê faşîzma Erdogan, li kerkidanê xwe suwar e, bi çete û hêzên paramilîter kotikê bela dike. Dîve, 3 zanistên disîplînekirî, Emerîka û Rusya vê rastiyê bibînin. Gelên cîhanê jî, bi rastiya “hêviya gelan dîse gel in”, berxwedanê dikin.



# Bi xebateke komînal karê xemilandina şarpeyan dikin

Hînî hunera xemilandina şarpeyan bû û di nava jinan de belav dike. Niha vê hunerê fêrî jinên ciwan jî dike. Şêniya ji Efrînê Silava Mistefa bi riya vê pîşeyê gelek jin di xebateke komînal de kom kirin.

Hunera çêkirina dora şarpeyan ji hunerên çandî tê hesibandin. Herwiha lêçûna wê kêm e û karê wê hêsan e. Efrînî ji wan re dibêjin ‘şaşî’. Şaşî xweşikbûnê dide kesên li xwe dikin. Rengên cuda tê de hene û bi morîkan tên xemilandin. Wek starekê ji bo serî yan jî wek xemleke li ser milan an jî di odeyên malê de wek semboleke çandî tên bikaranîn. Gelek jinên Efrînê vê pîşeyê dizanin. Yek ji wan jî Silava Mistefa (20) ye. Silava ji şêniyên gundê Badîna yê girêdayî navçeya Mabata ya kantona Efrînê ye. Mîna bi hezaran şêniyên kantona Efrînê, ew jî ji ber êrîşên artêşa Tirk a dagîrker û çeteyên wê tevî malbata xwe neçar ma ber bi navçeya Erhez ve koçber bibe. Silava pîşeya çêkirina dora şaşiyan di 13 saliya xwe de ji cîrana xwe ya temenmezin li gund fêr dibe. Piştî koçberiyê li navçeya Ehrezê careke din dest bi vê pîşeyê dike
Pîşeya çêkirina dora şaşiyan, ne hüner tene ye, jinên herêmê jî li hev kom dike. Li mala Silava jin kom dibin û di ber çêkirina dora şaşiyan re nîqaşên girêdayî girêdana bi çand û kulturê û rola jinan di parastina wê de dikin. Silava jinên ciwan ên navçeyê fêrî vê hunerê dike.



## Her maskeyek çîroka jinekê ye



Beyan Behramî (41) jineke ji bajarê Sîne yê Rojhilat e. Behramî hunermendek e ku ji kartonên hêkan, bi zelîqokê û ardê garisan maskeyan çêdike. Bi pêmana 8’ê Adarê û ji bo Newrozê, pêşengehek bi navê “Maskeyên Diaxivin” ya ku hestên jinan temsîl dike li Galeriyayê vekir. Behramî, got: “Di her maskeyê de çîroka jinekê heye.”
Beyan Behramî di serî de li Başûrê Kurdistanê dema ku zanîngehê dixwîne dest bi çêkirina maskeyan ya ku bi kartonên hêkan, zelîqok û bi ardê garisan tên çêkirin dike. Li Amedê li Bazargeha Galeriyayê bi pêmana 8’ê Adarê û ji bo Newrozê pêşangeh vekiriye. Pêşengeh di 9’ê Adarê de vebûye û wê heta 24’ê mehê berdewam bike. Pêşangeh ji hêlekê ve afirandina jinê dide der û ji hêla din ve jî bi maskeyên çêkirîn ku dayîkeke laçikspî, jineke nîvê rûyê wê girtîgehê, nîvê din jî azadiyê temsîl dike û ji maskeya ku devê jinekê bi bandê hatî girtin û yê maskeyeke din jî çavê wê bi bizmarekî hatî girtin rûyê jinê carnan weke nîşana azadiyê, carna weke tofanên ekolojiyê, carna xwezaya ku bi her cureyî reng vedide û carna jî weke qutkirina dengê jinê nîşan dide.

Behramî (41) ji Rojhilatê Kurdîstanê bajarê Sînê ye û li wir dizewice û niha jî dayika 2 zarokan e. Behramî pêşî li Zanîngeha Tahranê beşa sêwirandin û modelîstiyê dixwîne û heta demekî sêwirandina cilên şanoyê li Îranê dike. Pişt re jî ji bo Zanîngehê derbasî Silêmaniyê dibe. Li Silêmanî beşa turîzmê li Zanîngeha Silêmaniyê dixwîne û mezun dibe. Piştî ku Zanîngehê xelas dike ew hevjînê xwe êdî li başûr dijîn û li wir dixebitin. Dema ku DAÎŞ êrîşî Hewlerê dike û rewşa aborî tevlîhev dibe Beyam Behramî û hevjînê wê Mehdî Ehmed Puriyan berê xwe didin Bakurê Kurdistanê. Demeke kurt li Stenbolê dijîn û pişt re jî tên li Amedê dijîn. Ev 2 sal û nîv e ku li Amedê dijîn.

## Dirûnkar Wehîde bi xebata xwe parastina çand û mîrasa Kurdî dike



Wehîde Mihemed ji salên 90’î ve hunera dirûnkariyê dike, mîras û çanda kurdî diparêze. Herwiha tevî gelek koçberan jî di dirûnkarî û fêrkirina keçan a dirûtina cilên efrînî de bi israr e.
Wehîde Mihemed (50) ji şêniyên gundê Kobekê yê naçeya Mabeta ye û dayîka 4 zarokan e. Weke bi hezaran şêniyên herêmê koçberî kantona Şehbayê bû û li Kampa Berxwedan a navçeya Fafînê bi cih bû. Hezkirina Wehîde ya dirûnkariyê hişt ku bibe pispor. Herwiha di destpêkê de li mala xwe ya Şêxmeqsûdê kar kir û heta çend salan dirêj kir. Lê belê di encama êrîşên komên çete yên ser bajarê Helebê de, Wehîde tevî alavên xwe yên dirûnê koçberî kantona Efrînê bû da li wir dest bi xebatê bike û 8 salan dom kir. Piştî dagîrkirina Efrînê ji aliye dewleta Tirk ve, Wehîde neçar ma tevî şêniyên din berê xwe bide kantona Şehbayê. Li Şehbayê, Wehîde dîsa tevî derfetên kêm xebata xwe vejand.
Têkildarî parastina kevneşopiyê Wehîde Mihemed wiha axivî: “Dem min dest bi karê dirûnê kir, jinan cilên folklorîk li ber xwe nedikirin. Lê belê piştî şoreşê, pêşwaziyeke mezin a lixwekirin û dirûtina cil û bergên kurdî yên efrînî hebû.”
Wehîde wiha domand: “Xewna Erdogan ew bû ku em mîras û kevneşopên xwe winda bikin. Lê belê em wek jin ti carî kevneşopî û mîrasa xwe ji bîr nakin û emê pirtir pê ve girêdayî bin.”

## Kooperatîf ji bo birêxistinkirina jinan û xurtkirina rola wan a aborî wesîleyek e

Kooperatîfên çandiniyê yên jinan, li bajarên herêma Cizîrê hewl didin bi jinan re eleqedar bin da rola wan ji aliyê aborî ve xurt bikin û rola jinan di geşepêdana aborî de bi hêz bikin.
Kooperatîf li Bakur û Rojhilatê Sûriyê di pêşxistina aboriya herêmê û afirandina karê komî yê hevgirtî di navbera endamên civakê de roleke mezin dilîzin. Herwiha dixwazin derfetên kar û jêdarên qûtê malbatan peyda bikin.
Komîteya Aboriya Jinan a Kongreya Star kooperatîfên çandiniyê yên jinan li herêma Cizîrê dişopîne. Kongre girîngiyê dide jinên ku derfetên wan sînordar in ku tev li koopratîfê bibin. Bi armanca ku desteka wan bikin û derfetên kar ji wan re peyda bikin, tevî ku wan birêxistin bikin.
Li herêma Cizîrê 16 kooperatîfên çandiniyê yên taybet ên jinan hene. Tê de 409 jin şirîk in, di wan kooperatîfan de genim, ce û baqûlî tên çandin.
Li herêma Dêrikê rûbera zeviyên ku tê de kooperatîf hatine çêkirin, 580 hezar donim e. Bi tevlêbûna 147 jinan. Li navçeya Tirbespiyê kooperatîf li hezar û 500 donim bi tevlibûna 30 jinan hatin avakirin. Li herêma Girkê Legê rûbera zeviyên ku kooperatîf tê de hatine vekirin 6 hezar donim in bi tevlibûna 76 jinan. Li navçeya Amûde 210 donim di kooperatîfekê de bi tevlibûna 10 jinan hatin çandin.
Li kantona Hesekê qada ku di 7 kooperafîtan de bi tevlibûna 146 jinan hate çandin gihaşt derdora 10 hezar doniman.
Li navçeya Serêkaniyê ya ku artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê dagir kir, 42 hezar donim di 4 kooperatîfan de bi tevlêbûna 150 jinan hatibûn çandin.



# 'Peyama Rêbertiyê hêzê dide'

Berpirsê têkiliyên dîplomasiyê yê PYD'ê Bekir Hec Îsa diyar kir ku peyama rêber Abdullah Ocalan di pêvajoyeke hesas de hat û got "Peyama Rêbertiyê hêzê dide projeya li herêmê". Bekir Hec Îsa banga parastina destkeftiyên gelê Kurd û gelên herêmê kir.

Berpirsê têkiliyên dîplomasiyê yê Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) li herêma Firatê Bekir Hec Îsa têkildarî peyama rêber Abdullah Ocalan a 4'ê Adarê ji ANHA'yê re axivî.

Rêber Abdullah Ocalan di peyama xwe de ji bo gelê Kurd gotibû, "Her tişt girêdayî têkoşîna we ye, eger we pêşketin pêk anî, her tişt wê çareser bibe. Eger hûn nikaribin jî her tişt wê weke xwe dewam bike, tecrîd û herikîna xwînê wê berdewam bike."

## 'ARMANCÊN PEYAMÊ GELEK IN'

Bekir Hec Îsa da zanîn ku peyama rêber Abdullah Ocalan di demeke hesas de hat û gelek armancên wê hene. Îsa wiha got: "Tevî tecrîda di nava 4 dîwaran de, ji gel û doza wî dûr neket. Ev di peyama wî de diyar dibe, ramanên wî mîna hêz û destekê ji bo projeya neteweya demokratîk in."

Hec Îsa da xuyakirin ku Rêbertî banga yekitiyê, kombûna li derdora projeya neteweya demokratîk û xebateke hevpar ji bo parastina deskeftiyên bi xwîna şehîdan hatine qezenkirin, li gelên herêmê dike.

## 'ÇARESERÎ DI HÊZA GEL DE YE'

Îsa di berdewama axaftina xwe de diyar kir ku rêber Abdullah Ocalan ji siyasetmedarên Kurd dixwaze çav û dilê civakê bin da civakê ber bi riya durist ve bibin û pirsgirêkên wê çareser bikin. Îsa got, "Rêbertî diyar dike ku çareserî di avakirina hêza gel de ye ku welatiyan tevan di nava xwe de dhewîne. Bi hêzê tenê hûn dikarin xwe û projeya xwe ya ku hûn ji bo wê dixebitin, biparêzin."

Bekir Hec Îsa bi bîr xist ku rêber Abdullah Ocalan bang li Kurdên Bakurê Kurdistanê dike ku riyeke serbixwe hilbijêre ji bo ku nebin qurbnên komployên dewleta Tirk.

Hec Îsa got, "Peyama Rêbertiyê ji bo gelê Ereb şandî peyama ji bo şêniyên herêmê rehet bike ku jiyana hevbeş rêbaza herî guncaw a berxwedana parastina welat û jiyana aştiyane ye."

Rêber Abdullah Ocalan di peyama xwe ya dawî de gotibû: "Li Rojava gelek eşîrên Ereb hene. Tuyê ji tevan re gelek silav û hurmetên min bibêjî. Dîsa ji wan kesan re ku li wir di saziyan de dixebitin, gelek silav û hurmetên min bibêje. Kesên li Rojava kedê didin gelekî binirx in. Ji ber xebata wan ez wan pîroz dikim. Xebateke pîroz dikin. Serkeftinê ji wan re dixwazim."

Hec Îsa wiha pê de çû: "Hêza rasteqîn ne çek e, lê gel bingeha hêzê ye. Divê partiyên siyasî bibin yek û li hev bikin da ku civakê bi rêbazên rewa biparêzin. Rêber Abdullah Ocalan di payama xwe de dibêje kesên ku ji bo berjewendiyên kesayetî kar dikin, divê destên wan werin jêkirin. Ji ber ku projeya em pê rabûne ji bo azadiya gelan e ne ji bo azadiya kesayetî ye."



Bekir Hec Îsa di dawiya axaftina xwe de got, "Peyama Rêbertiyê hêzê dide projeya herêmê. Em bang li aliyan tevan dikin ku ji bo serxistina projeya demokratîk a li herêmê û parastina destkeftiyên gelê Kurd û gelên herêmê bixebitin."

## Xebata Tifaqa Kurdistanî: Em bi yekîtiyê dikarin rê li ber jenosîdan bigirin



Xebata Tifaqa Kurdistanî bi pêmana 32. ya komkujiya Helebceyê, diyar kir ku jenosîda Helebceyê bi şermezar dikin û wiha hat gotin: "Erkû her partî û Kurdistaniyan ew e ku rastiya neteweya Kurd bibinin û ji bo yekîtiyê bixebitin. Bi vî rengî dikarin pêşiya jenosîdên nû yên mîna Helebce bigirin."

Di daxuyaniya Xebata Tifaqa Kurdistanî, ya li Bakurê Kurdistanê de wiha hat gotin: "Berî 32 salan rejima Iraqê bi çekên kîmyayî êrîşî bajarokê Helebce kir. Di vê êrîşa hovane de 5 hezar Kurd hatin kuştin û bi hezaran jî birîndar bûn. Her çenda, li gorî qanûnan û destûrên navdewletî, bikaranîna çekên kîmyayî qedexe be jî, rejima Iraqê bê tirs û fikar li ber çavê cîhanê çekên kîmyayî bi kar anîn û li dijî Kurdan jenosîdeke mezin kir. Gelê Kurd ji ber vê jenosîdê hê jî di xeterê de dijî. Dema mirov li dîroka Kurd û Kurdistanê dinêre, dibîne ku gelek karesatên bi vî rengî hatine serê neteweya Kurd. Kurd ji bo ku mafên xwe yên mirovî bi dest bixin, gelek berdêlên giran dane. Niha jî ji bo parastina van deskeftiyan û mayîndekirina wan, divê teqez avakirina yekîtiya neteweyî erkekî dîrokî bibînin. Di rewşeke wiha de; erkê partî û hêzên Kurdistanî ew e ku rastiya neteweya Kurd bibinin û ji bo yekîtiyê bixebitin. Kurd bi vî rengî dikarin pêşiya jenosîdin nû yên mîna Helebceye bigirin. Em jenosîda Helebceyê bi dijwarî şermezar dikin."

## Sûriye xelateke jeosiyasî ye û divê were bidestxistin'

Pisporê Emerîkî Dr. Thoreau Redcrow got "Sûriye mîna textê kişika cîhanî ye. Aliyên destwerdanê dikin, ne wek pirsgirêkekê, wek xelateke jeosiyasî lê dinêrin û dixwazin bi dest bixin. Fikrê Ocalan nexşeriyeke demokratîk a alternatîf e. Kurd wê bibin hêza yekê ku hewl didin Rojhilata Navî ava bikin."

Aloziya Sûriyê derbasî sala xwe ya dehan bû û hê çareserî dûr e. Lewre aliyên destwerdana Sûriyê kirîn, dixwazin temenê vê aloziyê dirêj bikin, heta asta herî bilind sûdê jê bigirin û Sûriyê parçe bikin. Girêdayî vê mijarê ajansa nûçeyan Hawar bi pisporê nakokiyên navneteweyî û kar û barê Kurdan yê Emerîkî Dr. Thoreau Redcrow re hevpeyvînek kir. Hevpeyvîn wiha ye:

Li ser pirsa ajansê wiha axivî: "Mixabin Sûriye bûye textê kişika cîhanî. Gelek dewlet ji ber berjewendiyên xwe yên jeosiyasî bi wekîlan destwerdana Sûriyê dikin. Emerîka, Rûsya û Îran, Sûriyê ji bo ceribandina vîn û sozên xwe bi hev re bi kar tînin. Ji wê zêdetir, Tirkiye dixwaze projeya xwe ya Osmanî ya nû fireh bike. Hêvî dike bakurê Sûriyê tevlî erdê xwe bike, yan jî mîna bakurê Qibrisê bike. Di heman demê de Rêveberiya Xweser hewl dide mîna rêveberiyeke xweser herêmê li ser bingehê pirrengî û wekheviyê di navbera her du zayendan de ava bike.

Li ser nakokiyên Emerîka û rûsy jî Redcrow wiha axivî: " Emerîka û Rûsya nikarin bi awayekî eşkere şerê hev bikin. Lewre li cem her duyan jî çekên nukleerî hene." Û li ser siyaseta Tirkiyê jî got, Tirkiyê xwest rê li pêşiya Rojava yan jî Rêveberiya Xweser bigire da negihîje deryayê. Ji ber wê Efrîn dagîr kir û desteka komên cîhadî li Idlibê dike.

Li ser pirsa çima aloziya li Sûriyê çareser nabe, Redcrow wiha axivî: "Sûriye ne pirgirêkek e ku divê çareser bibe. Xelateke jeosiyasî ye ku divê were bidestxistin. Emerîka jî hêvî dike bi hilweşandina pergala El-Esed, nehêle Rûsya baregeha deryayî ya li Deryaya Spî li Tartusê bi dest bixe. Sûriyê hewl dide rê li pêşiya Emerîka bigire.



Li ser mijara Kurdan jî wiha got: "Madem ser 40 milyonî re Kurd li Tirkiye, Sûriye, Iraq û Îranê hene û di hebûna kurdî de mafên wekheviyê çi bi riya rêveberiyeke xweser yan jî serxwebûnê li tevayiya herêmên ku lê dijîn nîne, wê nakokî dewam bike.

Dr. Thoreau Redcrow herî dawî got, "fikrên Ocalan ji bo her dewletekê li Rojhilata Navî xeter in. Lewre nexşeriyeke demokratîk a alternatîf peyda dike. Bi şêwazeke ku mozaîka pirreng a herêmê xwe bixwe bi rê ve bibe. Ev jî tevayiya pergalên zordest û malbatên desthilatdar tehdîd dike.



# Ji şerê wekîlan veguherî şerê esîlan

Xetera herî mezin a li ser gelê Sûriyê destwerdana Tirkiyê ye. Şoreşa Sûriyê pir dirêj nekir û veguherî aloziyeke bi girêk ku ev 9 sal in dewam dike. Di dirêjayiya van salan de hêzên herêmî û navdewletî destwerdana Sûriyê kirin û veguherandin qada şerên dijwar. Gelo di van salan de gelê Sûriyê çi kişand?

Bihara Gelan ku sala 2010`an dest pê kir, bandor li piraniya welatên ku gelê wan di binê zexta desthilatdariyê de, kir. Bi agirê Mihemed Bo Ezîzî bi bedena xwe xistî, serhildanê li Tunisê dest pê kir û xwepêşandanên girseyî li seranserê Tunisê belav bûn. Pişt re li Misir, Lîbya û Yemenê jî belav bûn.

### ÇIRÛSKA ŞOREŞÊ LI SÛRIYÊ ÇAWA PÊ KET?

Wekî gelek welatên din ên Ereban, Sûriyê jî para ji vê Buharê girt. Destpêkê gelê Deraayê li dijî hikumeta Sûriyê rabû, pişt re weke çirûska yekê û ya herî girîng di şoreşa Sûriyê de Îna Rûmetê 18`ê Adara 2011`an dest pê kir. Piştî ku zarokan li ser dîwaran nivîsên xistina rejîmê nivîsîn, li gelek bajarên Sûriyê xwepêşandanên girseyî çêbûn.

Lê hikumeta Sûriyê bi dijwarî bi ser xwepêşandanan de çû. Guh neda daxwaziyên gel ên azadî, edalet û wekheviyê û li dijî xwepêşandêran çek bi kar anî. Ev serhildan li piraniya bajarên Sûriyê belav bû.

### DESTWERDANÊN DERVE BERÊ ŞOREŞÊ GUHERTIN

Piştî ku welat bû şanogeheke şerê leşkeri, siyasî û cihê tesfiyekirina hesabên hêzên herêmî û cîhanî, tevgera gelêrî li Sûriyê derbasî qonaxeke nû bû. Qonaxeke bixwîn dest pê kir. Di demekê de ku beşekî mezin ji xelkê Sûriyê ji welatê xwe koç kir, Sûriye ji bo dewletên cîhanê bû qadeke vekirî. Pişt re dewleta Tirk a dagîrker çek derbasî Sûriyê kirin. Bi vê re guhertineke mezin di xwepêşandanên aşîtyane de çêbû û li Sûriyê şerê desthilatdariyê dest pê kir.

Bi veqetîna di nava hêzên hikumeta Sûriyê de, dewleta Tirk a yekemîn bû ku destwerdan di kar û barê Sûriyê de kir. Tirkiye li ser erdê xwe kesên ji hikumeta Sûriyê veqetiyayîn perwerde kirin û bi serkêşiya istîxbaratên leşkerî "Artêşa Azad a Sûriyê" ava bû.

Di Tîrmeha 2011`an de, dewleta Tirk bi hevkariya Erebistana Siûdî û Qeterê piştgirî û çek pêşkêşî "Artêşa Azad"kir.

Bi destwerdana Îranê re Emerîka jî destwerdan kir da piştgiriya çekdaran bike. Emerîka destpêkê piştgirî bi xwarin û alavên veguhestinê kir, pişt re istîxbaratên Emerîkayê komên çekdar li Tirkiyê de, perwerde kirin.

### KUŞTIN, RÛXANDIN Û ABORIYEKE TÊKÇÛYÎ...

Ji ber destwerdanên derve û şerê desthilatdariyê, Sûriyê bi temamî hat rûxandin. Di aliyê mirovî de, li gorî daxuyaniya Navenda Çavdêriya Mafên Mirovan a Sûriyê SOHR`ê ya 4`ê Çileya 2020`an, ji destpêka aloziyê ve li derdora 585 hezar kes hatine kuştin û bi milyonan xelkê Sûriyê li derveyî welêt bûne penaber. Herwiha ji ber şer bi milyonan koçberî herêmên din ên hundirê Sûriyê bûne. DewletaTirk a dagîrker jî bû sedema bi sed hezaran gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê piştî ku herêmên pirniya xelkê wê Kurd bûn dagîr kir, ku herî dawî di Cotmeha 2019`an de bajarên Serêkaniyê û Girê Spî dagir kir.



## El-Mismarî: Erdogan xelîfeyê çalak ê terorîstan e



Ehmed El-Mismarî got "Erdogan xelîfeyê çalak ê terorîstan

Berdevkê artêşa nîştimanî ya Lîbyayê Ehmed El-Mismarî, roja Yekşemê di civîna çapemeniyê ya li paytexta Misirê Qahîreyê de têkildarî destwerdana dewleta Tirk li Lîbyayê ku ji 2014'an ve bi nepenî çêdibû, lê niha eşkere bûye, axivî û diyar kir ku serokkomarê Tirkiyê Recep Tayyîp Erdogan "xelîfeyê çalak ê terorîstan" e.

El-Mismarî da zanîn ku artêşa Lîbyayê di serî de Ebû El-Ebas El-Dîmeşqî, gelek Tirk û çeteyên sûrî yên girêdayî Erdogan ên li Lîbyayê kuştine û wiha dewam kir: "Nexweşiya mêtîngehkirina gelan ji nexweşiya Koronayê bixetertir e, me biryar da ku tevayiya hêzên dewleta Tirk, çeteyên sûrî û biyanî ji Libyayê derxin."

Têkildarî mijarê El-Mismarî diyar kir ku hêzên çekdar ên Lîbyayê di hundirê taxên Terablusê de hene û got, wê her tişta girêdayî Tirkiyê wêran bike

El-Mismarî da xuyakirin ku petrol û gaza Lîbyayê tev niha di binê serweriya Artêşa El-Wetenî ya Lîbyayê de ne û got, ya terorê li Lîbyayê dike Tirkiye ye.

El-Mismarî da zanîn ku Erdogan heftane ji 300 heta 400 çeteyî dişîne rojavayê Lîbyayê, her wiha nêzî 2 hezar terorîstên Cebhet El-Nusra û DAIŞ'ê jî şandine.

e û gelek Tirk û çeteyên Sûrî li Lîbyayê hatine kuştin."

## Çare di demokrasiyê de ye



**Zekî BEDRAN**

Li Rojhilata Navî rejîmên otorîter û dewlet-netewe, bûne çavkaniyên pirsgirêk û şeran. Heta dikarin desthilatdariyê di destê xwe de dihêlin, civakê bêîrade dikin û dikin bendeyên bêdeng. Ji guhertinên demokratîk û reforman re girtî ne. Li welatê xwe nirxên weke mafê azadiya fikir, xwebirêxistinkirin û serdestiya hiqûq tine hesab dikin. Qanûnên wan derxistîn, çawa ku qanûnên îlahî bin bi ser milyonan de disepînin.

Tirkiyê bisînor jî be, pesnê xwe bi avakirina demokrasiyê dida. Erdogan bi senteza "Islam û Tirk" rêveberiyeke faşîst û despotîk ava dike. Li Tirkiyê dema ber bi demokrasiyê ve vebûn çêdibû, civak rehet dibû û aborî xurt dibû. Niha ji bo ku Erdogan li desthilatdariyê bimîne, li hundir hêzên hember diperçiqîne, saziyên demokratîk bêbandor dike, hiqûq radike û xwe dixe şûna qanûnan. Di encamê de civak ma bênefes. Qeyrana aborî û siyasî kûr bû. Li hundir parçebûn pir bû. Li derve bi cîranên xwe tevan re ket nakokiyê û navbera wan xerab bû. Li Sûriye û Iraqê polîtîkayên şer û dagîrkeriyê dimeşîne. Itîfaqên dike tev li ser vê ne. Helbiku dema Tirkiyê bi Kurdan re dest bi diyalogê kirî û agirbest hatî ragihandin, rehetiyeke mezin çêbûbû, şer rawestiyabû û Tirkiye ber bi Yekîtiya Ewropa ve dimeşiya.

Li Rojhilata Navî rejîmên despotîk, bi xwespartina cemsera Sovyet-Emerîka hebûna xwe didomandin. Piştî hilweşîna Sovyetan û xerabbûna hevsengiyan, pêwîst bû li gorî geşedanên nû xwe biguherînin. Piştî hilweşîna hêzeke weke Sovyetan, diyar bû ku wê nikaribin rejîmên xwe yên despotîk û hişk heta qiyametê bidomînin. Lê hişmendiya wan ya hişk ku ji nermbûnê re girtî bû, rêveberî kiribûn dîlên xwe. Mînak; Sedam Huseyin û Hafiz Esed eger reformên demokratîk bikiran, destihatdarî bi parlamento û partiyan re par ve bikiran, evqas nedibûn hedef û ev şerên giran çênedibûn.

Dinya diguhere, teknîk pêş dikeve, civak ji vê rewşê bibandor dibin. Lê çawa ku ev tinebin rêveberiya xwe didomînin. Di dawiyê de serhildanên gel yên li Tunisê dest pê kirîn, şer û qeyrana derketî hin reveberî roxandin. Li ber çavan e ka Iraq di çi rewşê de ye û rewşa Sedam tê zanîn.

Sûriye niha bûye deverke wisa ku ev nakokî û şer lê kom û kûr bûne. Bi xurtbûna DAIŞê re hêzên navneteweyî jî tevlî vê tevlîheviyê bûn û ketin Sûriyê. Beşeke girîng ya Sûriyê di binê dagîrkeriya Tirkan de ye. Rêveberiya Şamê jî bi desteka Rûsya, Îran û Hizbullahê li ser piyan dimîne. Li Bakur-Rojhilatê Sûriyê bi pêşengiya Kurdan li hemberî DAIŞê têkoşîneke mezin hat kirin. Bi Kobanê re Emerîka û koalisyon jî tevlî bûn. Di rewşa heyî de li Idlibê Tirkiye bi artêşa Sûriyê re ket nava şer. DAIŞa kevin, El Nusra û gelek çeteyên din biçek dike, perwerde dike û di binê navê "Artêşa Sûriyê ya Neteweyî" de kom dike. Bi vî awayî artêşeke nû ava dike. Di rewşeke wiha de divê rêveberiya Şamê bi lez bi hêzên welatparêz û demokratîk yên Sûriyê re were cem hev û li hemberî dagîrkeriyê yekîtiyê çêke. Eger Sûriye ketiye vê rewşê diviya rêveberî para xwe jî tê de bibîne, mafê jiyanê bide kesên cuda difikirin û di çarçoveya pîvanên demokratîk de tevbigeriya.

Lê geşedanên bûyîn tersê wê ne. Rewşa Sûriyê ketiyê çawa ku şaşiya rejîma Be´esê tinebe, xetayên rêveberiya Şamê tinebin hereket dikin. Çawa ku li Sûriyê çand û baweriyên cuda tinebin hereket dikin. Rêveberiya Şamê hê jî mafê jiyanê nade kesên rêveberiya Şamê rexne dikin, xwe birêxistin dikin û fikirê xwe dibêjin. Yên wisa yan wê birevin biçin derveyî welat, yan bên tesfiyekirin, yan xwe bêdeng bikin.

Yên reviyayîn û Şamê rexne dikin, mohra ajantiyê li wan tê xistin. Bi milyonan mirov neçarî koçberiyê bûne. Welat bi giranî roxiyaye û dorpêçeke aborî û krîz heye. Riya derketina ji vê rewşê ew e ku li derdora Sûriyeyeke demokratîk kombûn çêbe. Ewropa mînaka li ber çavan e. Li Ewropa du şerên cîhanê çêbûn. Piraniya wê roxiya. Lê ders jê derxistin û Yekîtiya Ewropa ava kirin. Îro gelên li seranserê Ewropa bê ku şer bikin, di nava yekîtiyê de dijîn û her kes jê sûdê digire.

Çawa ku tiştek neqewimîbe rêveberiya Şamê dixwaze vegere berî 20011an. Niha li Bakur-Rojhilatê Sûriyê civak ji berê azadtir in û di rewşeke demokratîk de dijîn. Ewlekariya xwe pêk anîne, meclisên xwe ava kirin û ti kes hewl nade ku serdestiyê li yên din bike. Digel kêmayiyan demokrasî pêş dikeve. Ev ji bo Sûriyê tevê mînak e û alternatîfeke wisa ye ku paşrojeke aram diafirîne. Diviya rêveberiya Sûriyê li seranserê welat pêşiya demokrasiyê veke. Ku wisa bikira wê yekîtiya civakî û siyasî çêbûya. Lê li şûna vê bikin dixebitin ku vê alternatîfê jî ji holê rakin. Çi eşkere, çi ne eşkere nijadperestiya erebî pêş dixin û dibêjin eger hûn li gorî rejimê nemeşin wê belayeke mezin were serê we.

Li milekî dagîrkerî û gefên Tirkiyê, li milê din hebûna Emerîka, ku Rêveberiya Xweser dixwaze bi Şamê re bikeve diyaloyê û pirsgirêkan bi rêbazên siyasî çareser bike, şansekî mezin e. Divê Şam jî bersivê bide û qîmet bide her gava Sûriyê bigihîne aramiyê. Ji bo gelê Kurd ku gelê herî kevnar yê Rojhilata Navî ye, B. Esed dibêje; "Ev mirov ji ber Tirkan revîne hatine vir. Me cî da wan, me hewandin. Ewqas. Ango Kurd ne geleke e. Mafê wan yê nasnameyê û çandî nîne. Tiştên ku behsê dikin xeyal in." Halbiku di daxuyaniyên xwe yên berê de gotibû, "Kurd yek ji gelên herî qedîm yên Sûriyê ne û wê ti pirsgirêkên me bi wan re çênebin." Ev redkirin ti wateya ku aştî, edalet û demokrasiyê tine hesab dike. Rewşa siyasî jehrî dike û bêbaweriyê belav dike. Di vê mijarê de erkekî mezin dikeve ser milê rewşenbîrên Ereban, parêzanên hiqûq û demokrasiyê. Bi heman awayî rêveberiya Şamê jî ku ji paşroja Sûriyê berpirs e, divê li gorî berpirsiyriya xwe hereket bike, gera xwe ya li aştî û çareseriya siyasî bidomîne û deriyê xwe li demokratîkbûnê negire.